

**Dumahîk : Sûriye ,şoreş..**

mezin heya nuha nikarîne li hev bikin, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî jî heya îro nikariye helwesteke xurt bigirta, da ku bi yekdengî têkilî rewşa Sûriyê biba, şer bida rawestandî û ji Sûriyê re çareseriyek bidîta.

Li dawiya dawî nuha şerekî wisa li Sûriyê pevketî, ku ne rijîm, ne jî xelkê Sûriyê êdî nikarin bi tenê wî vemirînin. Ev şer rojane bi dehan xelkê bêguneh ji xwe re dike ardû û sotemenî. Eger sazî, hêz û dewletên mezin ên cîhanê herwekî hinek dewletên herêmê li hev nekin û ji kêşeya Sûriyê re çareyekê nebînin, rewşa Sûriyê dê hîn kambaxtir bibe û ne dûr e ku akam û ziyana xwe bigihîne welatên derdora xwe jî; nemaze jî Lubnan û Tirkiyê (ne dûr e Îraq jî).

Ev yeka hino- hino ji dewletên Rojhilata Navîn re, her weha ji dewletên mezin û cîhanê re dibe baweriyek. Mera pê hest dike ku hin aliyên navnetewî nuha bi amadekirina "plana B" (planeke nû) mijûl in, da ku hem xelkê Sûriyê ji vê dojhê biparêzin, hem jî herêmê ji şerekî demdirêj û sawdar biparêzin.

Vêca dem hatî ku her kes, yê ku xwe berketiyê mirovatiyê dibîne, hewla wê yekê bike û ji bo wê yekê kar bike ku di zûtirîn dem de ev şer (aşê mirovên bêguneh) bête rawestandî, nexşeriyek ji veguhartina (rûxandina) rêjîma Esed re bête amadekirin û bîrdoznameyek ji Sûriya pêşerojê (dahatûyê) re bête danîn. Bi baweriya min divê ew bîrdozname li ser bingeha rastiyên dîrokî û erdnîgarî, her weha li ber ronahiya rastiyên îro heyî bête amadekirin, da ku ji aliyê siyasî û rêveberî de asoyine nuh li pêş Sûriyê veke û Sûriyê bibe welatekî demokrat ku tê de hemû mirov û pêkhatiyên netewî û olî azad û wekhev bin; welatek ku hem hilbijartinên serbest tê de hebin, hem jî desthilatî û tekrewiya piraniyê li ser yên din nehêle. Ne jî elewî,

durzî û xirîstiyên bikevin bin zora tundrewiyêke olî ya ku kesekî din napejirîne. Gelê Kurd jî divê mafên xwe yê netewî wek gelekî li ser xaka bav û kalên xwe bi des bixe. Ev hemû jî, tenê di dewleteke weha de gengaz e, ya ku sistemeke nenavendiya siyasî ji xwe re bike bingeh. Ango divê Kurd, Ereben sunî, elewî û durzî li ciyê ku piranî ne karibin herêmên federal, encûmen û hukûmeta xwe ya herêmî ava bikin. Bêguman divê xirîstiyên jî li seranserî Sûriyê (ji ber ku ew ne tenê li herêmekê ne) xwedî mafên xwe yê olî bin û li wan tu stem nebe.

Eger mirov bixwaze rastiyê bêje, çareserî ev e.

\* **Endamê Serkirdayetiya Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê - Yekîtiya**

**Pîrozbahî**

Sekretêr û hemî endamên partiya yekîtiya demokrat a Kurd li Sûriyê –YEKÎTÎ- Silav û rêz

Di van dem , nîrên û hestewer de, evên ku şoreşa Sûriyê tê de roj bi roj dupat dike, ku qelenê azadiyê çiqas buha û bilind be jî, gelên Sûriyê xwe ji ber dana wî qelenî nadin alîkî, belê vaye didin û dê bidin jî, ta ku tava azadiyê û rûmetê seranserî Sûriyê digire.

Gelê me yê Kurd jî ji roja pêşî de mohra xwe li eniya şoreşê daniye, û rojekê ji pêdiviyên xwe nema ye, teqez dê ji destkeftiyên şoreşê bê par nemîne, lê wek hûn jî dizanin, bi destxistina wan destkeftiyên bê xebat û lebat nabe.

Di vê qoziyê re, ez vekirina bûrowa partiya we, ev partiya, ku rojekê ez di nav refên wê de dixebitîm, dinerxînim, pêre jî hêviyên min bi partiya we geş dibin, û baweriya min dupat dibe, ku ev partiya, ku di dema xebata nehênî de ji erkên xwe nedima, dê di dema xebata êşkere de bêtir çalak be.

Bi hêviya ku em careke din li welêt pêrgî hev bibin, ez vekirina bûrowa we li Efrînê pîroz dikim.

Heyder Omer